²¹Ev pîrsa hanê dê pir zanistvan û Mêjûvanên Welatên li Paşvemayî de bide bikarkirin. Bersiva vê pîrsê divê di çarçopê pêşvekevtina mêjûwa Mirovaniyê de û bi taybetî ve di kêra Şûreşa Firensî de der sala 1789 de û herwehaji Şûreşa Oktober der sala 1918 de di nava van millet û Welatan de bête kirin. Şûreşa Firensî kêra wêna pir bi giran ve li ser civakên milletên Rojava de hate biderkevtin û wê bigir tevaya gemara Padişahiya Derbegiyê di Ewropa de date bimalandin û wê rê ji bona Şûreşa Çêkirinê li sernaserî Ewropa de date rastkirin. Herwehaji wê di nava welatên Rojhilat jî de li Misrê de di pêla Mohamed Alî Paşa de ji 1805/1848 de, li Iranê di dema Şureşe de di 1907 de, li Selteneta Osmanî de di pêla şureşa Gencên Turkî de der sala 1908 , li Çapan de di şureşa 1862 de, li Çînê de di şureşa 1912 de di pêla Senyan Sit de ..hed de date kêrkirin; belam jibil Çapan pê ve ew wetov mîna Ewropa nehate biserkevtin.

Belam Şûreşa Oktober kêra wêna bêtir û xurttir di nava milletên li paşkevîyî de dihate biderkevtin, jiyên ku ew li jêr rêstika Kolonyaliyê û Impiryaliyê dihatin bidîtin. Di nava van milletan jî de milletê Kurdistanê jî dihate bidîtin. Heger ku Şureşa Firensî tevaya rêstika genîyî Derebegiyê li seraserî Ewropa de date birûxandin, wetov jî Şureşa Oktober tevaya rêstoka Kolonyaliyê û Impiryaliyê di nava milletên lipaşvbemayî de date bitarûmarkirin û xebata azadîxwazîya pîraniya wan milletan di serxwebûna wanî milî de date bitacûxelatkirin.

Hemû Şiyarvan û Welatperwerên Ewropa bi carekê ve ji bona Şureşa Firensî û Firensa didatin bilîlandin û bişabaşkirin. Wetovjî hemû Şiyarvanên Rojhilat û Welatperwerên wê jî ji bil hestîkojan û Xwefiroşan pêve ji bona Remanên Şureşa Oktober û Dostaniya Sovyêtê didatin bibangkirin.

Li vê derê de careke din ji nû ve ez ji Xwendevanan didim bihêvîkirin, ku ew di vî warê hanê de û li ser her pîrsekê de ji bona çarekirina pîrsa Kurdîyî welatî de bi herdu milên xwe ve ji pîrsa milî û civakî de ji xwe re li pêşgotina Xanî de ji berî bêtir ji

Partîya Demokratî Kurdistanî ligel partîyên dinî welatper de li Iraqê de bi xebata dijî Impiryalyê û pêla Padîşahîyê ve hate birabûn û wê xebata miletê Kurd bi karîn ve didate biajotin. Herwehajî wê bi karî ve di raperînên miletê Iraqî de û xwepêşandinên wî de didate bibeşdarîkirin, di yên ku milet têde tûrebûn û nayînkirina xwe ji bona desthilatîya Padîşahî didate biderxistin. Pir caran jî xwîna Kurd û Ereb dihate bitevlihevkirin.

Armancên partî bi diyar ve dihatin biderkevtin û ew wetov dihatin bikurtkirin, ku ew di xebatê de ji bona herifandina Rêstika Padîşahî de, di rizgarîkirina Iraqê de ji Impiryalyê, Hevalbedîtîyan û Peymanên Çavsorî de û di pêkanîna Rêstikeke Demokrasî de dihatin bidîtin. Herwehajî partî hergav li ser giringbûna hevalbendîtîyê de di navbera tevgera azadîxwazîya

Kurd û Ereb de didate bidubarekirin û wê bi jêhatîbûn ve ji bona xurtkirina biratîya Ereb û Kurd û Kêmayetîyên biratî li Iraqê de didate bikarkirin.

Herwehajî partî ji bona nehiştina bêsewadiyê, divakirina fêrkirina bingehî, vekirina bêtir ji dibustanan, Fêrgehên û Kolêcan didate bixebatkirin. Partî ji bona rizgarîkirina Jinê ji bendên kevneperestîyê û wekhevbûna wêna ligel Peye de didate bixebatkirin. Wê ji bona mafeyên Kargeran û başkirina zînetên jîyana wan û pêkanîna Komelan ji bona wan didate bixebatkirin. Herwehajî wê ji bona berzîkirina endazîya tevgera Cotkaran li Kurdistanê de û pêkanîna komelên Cotkarî didate bixebatkirin, da ku ew bi rola xwe ve di herdu beran de berê çandinîyê û welatî de pêtin birabûn. Herwehajî di bin rêberîya wê jî de Rêxistinên Demokrasi hatin bipêkhatin.

Nasîna partî di benda duwem de di bernama wêna de wetov hatîye binivîsandin: "Partîya me bi partîyeke demokratîyî pêşrevîyî

sêsed salî de ji Mem û Zînê de bi wiryayî û kûrî ve lê bidin bitemaşekirin. Bersiva derd û hemû serpehatîyên talîyên Kurd di wir de tête bidîtin; jiber ku Merov û Milet bi destên xwe ve mêjûwa xwe didin bidurustkirin. Bedbextîya Kurd bes û bi tenha ve di nezaniya wî de tête biderkevtin. Bedbextîya me nezaniya me ye û nezaniya me bedbextîya me ye. Cuma

56 Barzanî û Tevgera Azadîxwazîya Kurd 1958 - 1961

şûreşgêrîyî tête biderkevtin û ew berjewendîya Karkeran, Cotkaran, Xebatkeran, Destkaran û Zanevanên Şûreşgêrî li Kurdîstana Iraqê de dide biwênerîkirin".

Partî di belavkirina şiyarbûna milîyî welatîyî demokratî de li Kurdîstanê de hate biserkevtin. Li gora bîr û bawerîya min de ji giringtirîn bi serkevtinê wê ve têtin bidîtin, ku bi saya xebata wêna ve û bi piştgirêdana wê ve ligel cemawerên Kurdîstanê wê nasîna milîyê Kurd date biparastin. Ji dibustana partî bi hezaran ve ji Kadirên karîvan ve hatin biderkevtin, ji yê ku wan cihên rêberîyê di partî de û herwehaji di partîyên di pişt re durustkirî de ji xwe re dane biwergirtin. Herwehaji bi saya qencîya wêna ve hemû pîlanên Şovîniyan û Kevneperstan ji Ereba u Kurdan hatin biserkevtin, da ku ew Şûreşa Ilulê ber bi cenga Erebi Kurdî ve bidin birakişandin.

Partî bi xebata berî ve didate bibawerîkirin; jibervêji ve wê her û her ji bona beşdarbûnê di Berê Hevgirtina Welatî de didate bixebatkirin; tevîji ku ew ligel wê de di destpêka pêkhatina wê de nehate bikevtin; belam wê ligel Ber de di rêya Partîya Komonist de kar û bar didatin birêkxistin. Partî roleke berz ji bona dagirtina cemawerên Kurdîstan date bilîstin, da ku ew piştgirtina şûreşa 14 tîrmehê ji rojên wêyî pêşî de bidin bigirtin.

Evaya bi kurtî ve bi mêjûwa partî ve tête biderkevtin, vê partîya ku wê Şûreşa Ilula Welatîyî Mezin di bin Serokîtiya Mustefa Barzanî de dayite birêberîkirin û herwehaji wê ji Rêstika Begdadê bi pêrûniştina Ewtonomî ve ji bona Kurdîstanê di 11 avdara sala 1970 de date bisitandin. Ligel van bi serkevtin û bi cîanînên wêna jî ve ew berpirsiyarîya pêşî ji bona wan hemû şaşbûnan û nebaşîyan li ser çûna rêya xebata milletê Kurdîstanê de dide bihilgirtin; jiber ku ew bi partîya zikmakî ve tête biderkevtin.

Partîya Demokratî Kurdistanî û Şureşa 14 Tîrmehê

Di destpêka dazîna rabûna şûreşê de partî xweser piştî wêna date bigirtin û Komitîya Nawendî birûskeke piştgirtinê ji bona Rêberîya şûreşê date binardin û wê cemawerên Kurdistanê ji bona liberxwedana şûreşê de dijî her yekî datin bidagirtin, ji yê ku ew ji xwe re dixwaze çî ji hundur yanî ji derve bi dijî wê ve bête birawestandin.

Di 16 tîrmeha sala 1958 de partî ev daxuyanîya hanê date biderkirin:

Daxuyanî ji bona miletê Kurd

"Partîya Demokratî Kurdistanîya pêşrewa tevegêra azadîxwazîya Kurd ew bi çavekî giring ve li karên xweyî mêjûyî de ji bona gewrekirina hêza tevgera miletê Erebiyî azadîxwaz û bi serkevtina wêna ve û bi rizgarîkirina Iraqê ji serdarîkirina Padîşahîyî genîyî dilxelandî ve û herwehaji ji bona durustkirina Rêstika Komariyî rizgarîkirî û xwe kişandîna Iarqê ji Peymana Begdagê, ya ku wê berê kevanên ji bona nava dilê netewê Kurd dayite bivekirin, dide bitemaşekirin. Ev tevde bi carekê ve bi hev re xurttirîn bingehan ji bona pêkanîna jîneke tije bi xweşiyê, bi azadîyê û bi wekhevbûnê ve di navbera miletên Ereb û Kurd de dide biamadekirin. Jibervêjî ve partî date bibiryarîkirin, ku ew bi hemû hêz û karînen xwe ve liberxwedanê ji bona Komara Iraqî, ji bona bi hîmkirina wêna ve û bi geşkirina wêna ve bide bixebatkirin. daku ev mebesta hanê bête bicîhatin, partî tevaya Endam û Layîngerên xwe nala Canpêşkeşan ji bona Komara Iraqê ji bona liberxwedana Impiryalîyê, vîlikên wê û Nokerên wê de dide bidanîn".

Herwehaji Barzanî Serokê partî gelek caran piştî vegêra wîna ji Sovyêtê didate bidazanîn, ku ew xwe bi Serbazekî ji Serbazên şûreşa 14 tîrmehê ve dide bidîtin û ew xwe li jêr rêberîya Ebdul-Kerîm Qasîm de dide bidanîn.

Partî Şandîyên ji heremên Kurdistanêyî cudan ji bona amadebûnê li Begdadê de date birêkûpêkxistin, da ku ew pîrozbayê ji bona

Rêberên şûreşê bidin bipêşkeşkirin û da ku ew ji bona wan piştgirtina xurtî Xelkên Kurdistanê bidin biderxistin. Weha Begdadê gewretirîn dagirtineke Kurd di 27 tîrmehê de ji xwe re date bidîtin. Di gava ku Rêberên şûreşê pêşewazîya Şandîya Kurdistanîyî gewre di bin serokîtiya Ibrahîm Ehmed, Elî Ebdul-Lah û Nûrî Ehmed Taha datin bikirin²², Ibrahîm Ehmed Sikretêrê Partî peyvdarîyeke giring date bigotin, ya ku wî tede li ser destana miletê Kurd de di bin sîbera pêla Padîşahî de date biaxivtin û herwehaji wî li ser helwesta partî û miletê Kurdistanî piştgirtî de ji bona şûreşê date biaxivtin û evjî bi metnê wê ve tete biderkevtin:

Serwerê Serokê Civata Serwerîyê

Sewerê Serokê Wizaretê û Serdarê Giştîyî Hêzên Çekdar

Çavpêxistinek ji bona birêveçûna pêwendîyên Kurd û Ereb ji pêla kevtina Kurdan ji bona ayîna Musulmantîyê ji me re bi diyar ve dide biderxistin, ku herdu miletên li tenîştê hevdu de her û her dostanîyeke xurt di navbera wan de dihate biderkevtin û li ser pêwendîyên wan de aşîfî û dostanî dihatin bizalkirin. Di pêla Musulmantîyê de pêwendîyên wan li ser bîr û bawerîyên Musulmantîyê de dihatin birêkûpêkxistin, ji yên ku ew li ser wekhevîyên de di navbera Musulmanan de dihatin bipêkhatin û ku di nava wan de cudabûn di navbera Erebekî û Bêganeyekî de bes û bi tenha ve li ser bipêrabûnên wan de bi karên ayînî ve û li ser bipêrabûnên wan de bi karê baş de dihat biderkevtin. Di pêla Osmanî de herdu miletan pir rengên cudan ji nizimbûnê, zordarlêkirinê, birçîbûnê û bêbehrbûnê ji destên Dijminekî didatin biwergirtin, yê ku wî welatên wan bi embarkirinekê ve dabû bikirin û ji miletên bi serbazxaneyekê ve dabû bikirin, da ku ew wan ji bona tenûra cengên xweyî li dûhevduyî vexistî de bide bipêşkeşkirin.

Pistî cenga cîhanîyî yekem Dewletên Impiryalîyî bi serkevtî ve welatê Ereb û Kurdistan di nava xwe de dane biparvekirin, da ku ew bi wê parkirina hanê ve wan bidin bitalanîkirin. Ingilîzan piştî dazanîna şerragirtinê Wilayeta bi Musulê ve bi navkirî ji xwe re date bivegirtin, ya

²²Mamosta Elî Ebdul-Lah dide bigotin, ku Partîya Serxwebûnê û bi taybetî ve Mamosta Sidiq Şenşil alîkarîyeke bi sipasî ve di wê rojê de ji bona bi rêxistina dîtinê di navbera Şanda Kurd û Rêberên şûreşa 14 tîrmehê bilikarxistin.

ku tède bi pîrbûn ve Rûniştvanên wê ji Kurdan têtin biderkevtin. Wetov bi vî rengê hanê ve Pîrsek bi navê pîrsa Musilê ve hate bipeyda kirin û ew di dema xwe de, weku ku ew bi diyar ve tète biderkevtin, di rêya bilêpirskirina giştî de hate biçarekirin, ya ku tède perçeyekî mezin bîr û bawerîya xwe dane bidan, Hinekan jî wan bîr û bawerîya xwe ji bona pêkanîna dewleta Kurd dane bidan û hinên din jî wan bîr û bawerîya xwe ji bona jîyana ligel Erb dane bidan, bi mercekî ve ku ew bi rengêkî serpereştîya Nenawendî ve bêtin bixelat kirin²³

²³di vir de Ibrahîm Ehmed tevaya daxwaza Kurd di lêpirskirina milî de bi serû-binîhevdû ve dide bikirin; jibervêjî ve jî xwe re li ser Pîrsa Musilê de bidin bitemaşekirin, mîna ku ew di "Kurtîyeke Mêjûwa Kurd û Kurdistanê Ji Destpêkirina Mêjûwê Tanî vê Rojê" jî bal Mohemed Emîn Zekî Beg" de hatîye binivîsand:

"Pîrsiyarîya Musilê

Pîrsiyarîya Kurd bi tenha ve bi ser welatê Musilê ve hate bivegivaştin, Ku ew bi kê ve bête bigirêdan, divabû ew jî bal Hevgirêdana Netewan de bihata binîşankirin.

Di dawî de Hevgirêdana Netewan jî bona lêgerandinê li daxwazên Ingilîzî, Turkî û Pîrsyarîkirina Arezoî Xelkê wê de bi pêkanîna binardina Encûmenekî lêgerandinê di 30 kewçêrika sala 1924 de date bibiryarî kirin.

Civata Hevgirêdanê di 13 çêrya duwem de di sala 1924 de ev Encûmena hanê date bipêkxistin. Ev pêkhatina hanê jî Peyayekî Gewreyî Mecercistanê Kont Tilîki, jî Siwêdê Misyô F. Wîrson û Kolonêl Bolis jî sipahê Belçîkî ve hate bipêkhatin.

Evan li dawîya çavpêketina wan de ligel dewleta Ingilîzî û Turk de di 16 rêbenda sala 1925 de bi Bexdê ve hatin bigihaştin.

Herwehaji Wênere Turk jî ligel wan de bû. Li Bexdadê Wênerekî dewleta Îraqê jî tev li wan bû. Ew tev de jî bona lêgerandinê jî bona welatê Musilê û hemû cîgehêkî geryan. Li dawîya bidawîanîna Karmendîya xwe de ew vegeyîyan û di 16. tîrmeha sala 1925 de Raportekî dûr û dirêj jî bona Civata Hevgirêdana Netewan dane bipêşkeşkirin û wan di vî Raportê hanê de derbarî Kurd de û welatê Musilê de datin bigotin:

"Divê guhpêdan derbarê nişankirina Karmendên Kurd jî bona serpereştîya welatê wan û xwendinê di dibustanan de, dadkirin û liberxwedan bi zimanê wan ve bi arezuwa

60 Barzanî û Tevgera Azadîxwazîya Kurd 1958 - 1961

Vê zînetê hanê ber bi vêkevtina şûreşên Kurdî ve date biajotin,

Kurdan ve bête bikirin û zimanê Kurdî bi zimanê mîrî pê bête birûniştin. Encûmen di wê bîr û bawerîyê de ye, heger li dawîya çar salan de li paş wergirtina peymanê Ingilîz û Îraqê de û hêlsana Çavdêriya Hevgirêdana Netewan ji ser Îraqê de ji bona pêkanîna serpereştîyêke cihî peyman ji bona Kurd pê neyêtin bidan, beşê zor ji Kurdan serpereştîya Turkî di ser serdariya Ereb de didin bigirtin" (P. 111, Benda 7. Movika 2 ji wergerandina Raportê Encûmenê).

Civata Hevgirêdanê li ser vî Raportê hanê de li 16 rênda sala 1925 de hin mercên hilanê dane bibiryarkirin. Welatê Musilê ji bona dewleta Îraqê date bidan. Wergerandina Benda Sêyemî vê biryaryê jî eve ye:

"Dewleta Ingilîzê ji ber ku ew dewleta dest li ser Îraqê de ye, divê ew bicihanînen pêrabûnên xwe beramber peymanên derbarê Serpereştîya Cihî de ji bona Kurdên Îraqê ji bal Encûmena Lêgerandinê û ji encamên dawîyî temînîyên wê de li ser Civata Hevgirêdanê de bide biraxistin".

Li ser daxwaza Wezîrê Koloniyên li 3 kewçêrînkê 1926 de bi peyveke dirêj ve pêrabûnên başbûna nêta dewleta Îraqê derbarê Mafeyê Kurdê Îraqê de li ber Hevgirêdanê de date biraxistin û giraw wî ji bona wê ji bona bicihanîna wan jê re date bikirin".
Cuma

. Wetov Wilayeta Musilê û di nava wê jî de Kurdistana jêrîn bi Îraqê ve bi rengekî mîrî ve der sala 1926 bi pê ve hate bigirêdan. Wetov jiber ku destûra Iraqîyê kevin berî wê demê hatibû bidanîn, tu metnî dustûrî beramber bi mafeyên Kurdîyû milî ve û herwehaji ji bona wê serpereştîya taybetîyî daxwazî jî ji bal Kurdan de tete nehate bikevtin. Bes û bi tenha ve mafeyên Kurdan û girawkirina wan li ser hinek peyvdarîyan hate bitirxankirin, ji yê ku Berpîrsiyarên Ingilîzî û Iraqî di hantinan de didatin bigotin, yanî ew di nava hin sozan de di hate biderkevtin, ji yê ku Ingilistanê li ser xwe de beramber bi Hevgirêda Netewan de bi ser mîletên xwe ve der sala 1922 de dabûn bihildan û herwehaji pêrejî ev di qanûnekê de di hatin biderkevtin, ya ku ew di bin navê qanûna zimanên cihî de hate biderkevtin. Belam bi tevî jî li hêç û pûçbûna van mafeyên hanê jî ve Ingilîzan û herwehaji kêmtîya serdarîyî Iraqî, ya ku wê bi fermana Ingilîzan ve didate bifermendarîkirin, nedane bihiştin, ku Kurd ji xwe re wan mafeyan jî bidin bikaranîn. Wetov Kurd di seranserî wan salên dirêj de, ya ku tede welat ji bal Merovên pêla nemayî de di hate biserdarîkirin, bi du rengên zordariyan û çewisandinan ve di hatin birûkirin. Di pêşîya pêşî de wan ligel hemû mîletê Iraqê de di wê pêlê de beşdariya perîşanîyê, nezaniyê û nexweşîyê didatin bikirin, ya ku tevaya gelê Iraqî di bin de ji zordariyê û sitemê didatin biahînkirin. Herwehaji biservêjî ve mîletê Kurd di bin zordariya milîyî taybetî de û bê behrîkirina wî ji mafeyên wîyî milî de di hate bijiyandin.
Cuma

yên ku hûn wan didin binaskirin û yên ku Impiryalvavan û Nokerên wan pir dev ji bona wan didatin biavêtin û bi pir pesnên bed didatin binavkirin. Geh wan ew bi tevgerên cihêbûnê ve, gehjî bi tevgerên ser bi Ingilîzî ve û gehjî bi tevgerên ser bi Komonistîyê ve didatin binavkirin, di dema ku ew bes û bi tenha xwe ve bi tevgerên milîyî azadîxwazî ve dihatin biderkevtin, yên ku wan rizgarîkirina welêt ji Impiryalîyê û Nokerên wan û ji nûve avanîkirina pêwendîyên Erebî Kurdî li ser bingehên xurt de ji bal herdu miletan de didate biarmanckirin, bêyî ku Impiryalî destên xwe di nava wan de bidin bidirêjkirin û wê siyaseta xweyî Impiryalî "belavkirin û zalkirinê" ji xwe re bidin bicîanîn. Herwehajî Impiryaliyan û Nokerên wan ji her kesî jî bêtir didatin bizanîn, ku ev şûreşên hanê ji bal Kurd de ne ji bona cihêbûnê dihatin bivêkevtin; jiber kurdan didatin bizanîn, ku cihêbûn zîyanê bi pirsê wan ve dide bigihandin û helwesta wan dide bilawazîkirin û herwehajî ew zîyanê ber bi berjewendîyên miletê Ereb ve dide bixistin û ew helwesta wî dide bilawazîkirin. Herwehajî Impiryaliyan ji her kesî bêtir jî didatin bizanîn, ku ev şûreşên hanê ne bi destên wî ve hatine bidurustkirin; heger na, ma çima ew wan bi wê hovîtî û diranîya hanê ve dide binabûdîkirin û ew ji bona wê mebesta hanê hemû karînen xwe li jêr destên Nokerên xweyî Serdarên Iraqî de didin bidanîn. Ma çima jî dê Ingilîz Kurdan li ber Nokerên xwe de bide birakirin, yên ku ew ji peyên wan ji wan re bi dilsoztir ve têtin biderkevtin û ma dê çima jî wan dijî zînetekî bidin birakirin, ya ku ew bi baştirîn zînet ve ji wan re têtê biderkevtin, ya ku ew têtê dikarî jî xwe re dilbijandinên xweyî Impiryalî bidin bicîanîn? Hegerjî ku ev tevgerên hanê ji bal Impiryalîyê de bihatana bipiştlêgirtin, magelo dê çi li ber bi serkevtina wan ve bihatana birawestandin?

Hêjbêtir magelo ne hêzên Impiryalî bi xwe ve beramberî parvekirina welatê Kurdan têtin biberpirsiyarîkirin? Belê Impiryaliyan û Nokerên ji her kesî bêtir didatin bizanîn, ku ev şûreşên hanê ne bi Komonistî ve dihatin biderkevtin; jiber ku bi pêşvekevtina abûrî, civakî û siyasîyî miletê Kurd ve ne di wê qonaxê de dihate biderkevtin, ya ku wî têtê dê bikarîba bi tevgereke Komonistî ve bihata birabûn. Belam ev vegotinên virî hanê ji bal Impiryaliyan û Nokerên wan de, yên ku ew dihatin bigotin, didatin bixwestin, ku ew pê hêrîşên xwe li ser Kurdan de

62 Barzanî û Tevgera Azadîxwazîya Kurd 1958 - 1961

bidin biderbaskirin, yên ku wan pê şûreş didatin binabûdîkirin, navên wan pê didatin bixerabkirin û kîndarîya Ereba pê beramberî Kurdan didatin bigûrkin, da ku ew wê siyaseta Impiryalî "belavkirin û zalkirin" bidin bicîanîn. Nebes tenê Kurd bi şûreşên xwe ve dihate birabûn, lêbelêji wî di hemû serhiladên azadîxwazîyên gelê Iraqî de bi giştî ve didate bibeşdarîkirin. Wî zindanî, dûrîkirin, derbiderîkirin û kuştin bi hohêyên van beşdarbûnan ve didate bixwarin û bi serdejî ve wî derdên dijwar di encamê şûreşên xwe de ji kuştinê û derbiderîkirina bi komel ve bi bedtirîn reng ve didatin bixwarin, mîna ku ev bi serê Eşîra Barzanî mêrxas ve û bi ser welatê wanî sipehî ve hate bikirin, jiber ku ew bi tevgerê geke azadîxwazî dijî Impiryalîya zordar, zînetên genî û desteyê serdarîkirina rizyayî ve hate birabûn.

Desteyê serdar di pêla genîbûnê de ligel pêrabûnên wêyî tawanî de beramberî serhildanên gelê Kurd de destên xwe ji bona destikên din ji bona şerkirina wan serhildanan date biavêtin. Di pêşî de ew ligel Peymana Seed Abad de hate bibeşdarîkirin. Di pişt re wê lihevhatina Turkî - Iraqî der sala 1946 de date bigirêdan û herwehaji di pişt re wê Peymana xwe ligel Peymana Begdadê de date bigirêdan. Ew peyman û lihevhatinên hanê ji aliyekî de bi dijî tengkirina gorîya tevgera azadîxwazî Kurd ve ji hemû layekî de dihatin biarmanckirin, da ku ew wê bi komel ve bidin binemanîkirin. Ji aliyê din de wê destê xwe ji bona bergirtin û bi pêşveexistina Kurd ve date biavêtin, ev jî bi çuna li ser siyaseteke zordarîyî regezperest de bi beramberî wan ve dihate biderkevîtin, ku hêjî şopên vê siyaseta hanê ji çend nimûnan tete biderkevîtin, ji yên ku ez dê wan bes û bi tenha ve ji bona nimûbe bidim biraxistin:

Yekem: Hembêzîkirina desteyekî kêma ji Nokeran û Bêbextên Cavorsan ji Kurdan û razîkirina wan û di serguhên xwe re avêtina mîletê Kurd.

Duwem: Hewildana bi nemankirina li ser zimanê Kurdî de û nehiştina bi karanîna wêna nala zimanekî mîrî ve di dam û destgehên mîrî de û herwehaji ne bi cîanîna qanûna zimanên cihî ve ji bil di hin cihên kêma de, da ku berê bi

cînanîna wê bête bitengkirin.

- Sêyem: Veguhertina navê Kurdistanê bi navê Jorbûnê vê û navê Kurd bi Jorvanan ve di her hatinekê de.
- Çarem: Nardina jimareke kê m ji Kurdan ji bona Xwendekarîya Derve û wergirtina jimareke pir kê m ji Xwendevanên Kurd di Kolêcên Iraqî de bêyî ku hîç li endazîya serjimara Kurdan de bête bitemaşekirin, vêna date bihiştin, ku jimareke kê m ji Zanevanên Kurd di karmendîyên serdarîyê de bidin bikarkirin.
- Pêncem: Çûn li ser siyaseteke rehperestî de di derbarê nîşankirinê û karmendîkirina serdarîyê de.
- Şeşem: Çûn li ser siyaseteke rehperestî de di sipah de di derbarê bilindkirinê de dipayebûnên taybetî de û herwehaji pir bi kê m ve wergirtina Kurdan di Kolêca Cengoş de.
- Heftem: Hîç tu rê bi Kurdan ve nehatîye bidan, da ku ew ji xwe re bi karanîn mafeyekî siyasî ve pê bêtin rabûn, herwehaji ew nikarin ji xwe re tu rojnameyeke siyasî ji bidin biderxistin, hegerji çi ji mêldarîya wê yanji berê wê ji bête biderkevtin.

Vê siyaseta rehperestî şaşî mebestkirî paşvekevtina kurd ji pêşkevtinê date bikin. Wetov miletê Kurd di pêla genîbûnê de bi zordarîyeke dualî ve dihate bizordarîkirin; jibervêjî ve wî ji bona du armancan didate bixebatkitin: 1. Da ku ew Iraqê ji Impiryalîyê û ji rêstika serdarîya genî de bide birizgarîkirin û 2. Da ku ew mafeyê xweyî milî bide bicîanîn û bigirawkirin.

Azadîxwazên Kurd bi mil ve li teniştê Azadîxwazên Ereba de di hemû beran de û di hemû şeran de didate bixebatkin. Ew ligel Azadîxwazên Ereba de ji bona nava zindanan de hatin bikevtin, ew hatin bikuştin û ew hatin bidûrkin. Wan bi carekê ve didatin bihêvîkirin û

bibawerîkirin, ku bi nemankirina Impiryalî û Nokerên wîyî Bêbext ve de girawkirina xurttirîn bingehên pêwendîyan di navbera milîbûna Ereba û milîbûna Kurd de bi canekî biratî û wekhevîbûnê ve bêtin bidurustkirin, yê ku wî li ser pêwendîyên wan de di dirêjbûna mêjûwê de dihate bizalkirin. Herwehaji Azadîxwazên Kurd bi hemû bawerîyê ve didatin bibawerîkirin, ku her bi serkevtîneke wergirtî ve ji bona milîbûna Kurd di xebata wîyî azadîxwazî de bi serkevtînekê ve ji bona milîbûna Ereba bi giştî ve tete biderkevtin. Herwehaji ku bi nabûdîkirina Impiryalîyê û Pêyên wêna ve li Iraqê de ew bi serkevtînekê ve ji bona pîrsa herdu milîyên Ereba û Kurd bi rengekî taybetî ve tete biderkevtin²⁴.

Li ser vî bingehê hanê de û bi vê bawermendîya hanê ve Kurd di vê şûreşa pîroz de hatin bibeşdarîkirin, yê ku sipahê Iraqî ew ligel piştgirtina mîletê Iraqê de date bicîanîn, da ku ew pê desthilatîya Taqîmê serdarî genî bidin binabûdîkirin.

Li ser vî bingehê hanê de û bi vê bawermendîya hanê jî ve Kurd bi amade ve tete biderkevtin, ku ew li ber azadîya xweyî nihhatî de bi xwîn û canên xwe ve bidin bidan. Metnê nivîsandî di destûra demî de bi

²⁴Belê Kurdan ji dil û can bi van bîr û bawerîyên bilind û bi nex ve beramberî Milîbûna Ereba didatin bibawerîkirin; belam ratstîya tîrş û talîya serpehatîya jînê zû Kurd datin bişiyarkirin, Regezperestên Ereba bi gelekî ve ji Impiryalîyan bi hovtir û bi dirtir ve dihatin biderkevtin û wan li ser hemû qencîyên Kurd de bi kurtî ve Kurd bi Bombên Biyolocî û Kemyawî ve der 16/17 avdara sala 1988 de bi qîrkirina bajarê Helebçe ve, bi wêrankirina bêtir ji 4500 gund û wargehan û biryara qîrkirin, kole û bendekirina Kurd, talankirina dewlemendî û Erebkirina Kurdistanê dane bixelatkirin. Belê ew bîr û bawerên Xebatvanên Kurd ji pakbûna dilê wan de dihatin biderkevtin; belam di rastîya rastî de bi hemû tîrş û talîyên wan serpehatîyan de ew di netêgihîştina wan de di mêjûwa wan de dihatin biderkevtin.

Sadî Şerazî bi saya serê Segê Esfehanê ve mîletê xwe ji van xwe xapandinan û bedbextîyan date biparastin. Heger me jî ji xwe re nivîsta Encam bidata bixwendin û bi hûr û kûrî ve li ber serpehatîyên pîr bi derd ve û pîr bi tîrş û talîyî Yaran ve bihatana bikevtin, dê bêgûman meyê jî xwe nala mîletê Iranê ji wan xwe xapandinan û bedbextîyan bidana biparastin.

Pîr bi pîrî ve li vê derê de ez dikarim li ser wan serpehatîyên tîrş û tal ligel Rom, Ereba û Eceman de bidim binivîsandin, dibe ku ez rojekê li cihekî din de li ser wan serpehatîyên tîrş û tal de bidim binivîsandin. Cuma

biryardanê ve li ser mafeyên milîyî Kurd de û bi danîna Ereba û Kurd bi hevbeş ve di vî welatê hanê de ew bi berê xebateke hevbeşî ve tête biderkevtin û herwehaji hêjbêtir ew rastîya çûna rêya Azadîxwazên Ereba û Azadîxwazên Kurd dide biderxistin, ku xebatên miletan bi livandineke bi xelekên bi hev re girêdayî ve têtin biderkevtin. Em bi gelekî ve bi vê destpêka bextiyarî ve di vê pêla meyî Komarîyî nuh de têtin bimizgînîkirin. Em hêvîdarin, ku dê yasayên pêwest ji bona bicîanîna wî metnê di destûr de bi navkirî ve bêtin biderkevtin. Herwehaji em didin bihêvîkirin û bibawermendîkirin, ku her gaveke avêtî ji bal Komara meyî nuhhatî de derbarê xurtkirina pêwendîyan ligel dewletên Ereba azadîxwaz de dê pêrejî sed der sed gavekê jî bêtir firehtir ji bona mafeyên milîyî Kurd bête biavêtin. Weha ku her gaveke avêtî ji bal milîya Ereba de tête biavêtin, da ku ew xwe bêtir bi nêzîkî armancên xwe ve bide bikirin, wetov jî di wê demê jî de divê Kurd jî xwe bi nêzîkî armancên xwe ve bide bikirin. Bes û bi tenha ve û bi vî rengê hanê ve wetov em dikarin hemû kulekan di rûwê Impiryalîyan û Nokerên wan de bidin bidadan û herwehaji dê pê emê nimûneyekî bidin bipêşkeşkirin, bê kanî çawan du milîbûnên bira di bin sîbera Rêstika Komarîyî Demokrasî azad de dikarin ligel hevdu de bidin bijîyandin.

Ez pir sipasîya milête Kurd di rêya wênerîya vê Şandîya hanê de li ser wî metnê hatî de di destûra demî de didim bipêşkeşkirin, herwehaji ez tevaya dilsozîya hestyarîya bilind didim biderxistin, yên ku miletê Kurd wan beramberî Komara meyî nuhhatî de, Rêberên wêyî Azadîxwaz û Sipahê wêyî gerans didin biderxistin. Kurd bi amade ve ji bona liberxwedana Komara xwe de û herwehaji ji bona liberxwedana mafeyên xweyî milîyî wergirtî de bi xwîna xwe ve, bi canê xwe ve û bi malê xwe ve tête biderkevtin.

Bijî Komara Iraqî, Komara Ereba û Kurd!

Helwesta partîyî piştgirtîyî ji bona şureşê di bêhna pêşî de ji dazanîna wêna de û bi derkevtina bi hezaran ve ji Zaroyên miletê Kurd di bajar û bajarokên Kurdistanêyî cudan de ji bona ser şeqaman li jêr rêberîya rêxistinên partî de bi derxistina piştgirtina xwe ve ji bona şureşê ve û bi amadebûna xwe ve ji bona liberxwedanîya wêna de pir kêreke mezin li ser aramîkirina zînetê giştî de ji bona berjewendîya şureşê li

66 Barzanî û Tevgera Azadîxwazîya Kurd 1958 - 1961

Kurdistanê de date bikirin; jiber ku jimareke pir ji Efseran, Serbazan û Polîsan ji Kurd bûn û ew ji Endamên Partî bûn û yanjî ji Layîngîrên Partîya Demokratî Kurdistanî bûn, yê ku ew bi roleke karkirî ve ji bona zalbûna li ser yekaneyên sipahîyî girêdayî li Kurdistanê de pê hatin birabûn û wan datin bihewildan, ku tu li berrabûn de di nava wan yekaneyên hanê de neyêtin bikirin.

Barzanî û Şureşa 14 Tîrmehê

Şûreşa Tîrmehê hêvî û vîyanên Barzanîyan didate bigewdekirin, yê ku wan li jêr sîbera pêla Padîşahîyê de tucarî hestyarî bi asayîşê û aramîyê ve nedidatin bikirin; jiber ku herema Barzan ji bona sê hêrîşên sipahîyî fireh di salên 1932, 1943 û 1945 de hate bitûşkirin, gava ku Barzanîyan bi şûreşê ve bi dijî pêla Padîşahîyî genî, Serwerên wan û Damezirandvanê wanî Ingilîzî ve hatin birabûn. Efserên Ingilîzî bi serdadanên sipahê Iraqî ve mîna General Robson di livandinên 1932 de û General Renten di 1945 de didatin birêberîkirin. Herwehajî Balafirên hêza asmanîyî Padîşahî Ingilistanê R. A. F. beşdarî di şeran didatin bikirin û wan gundên aram, Pîrek û Zarokên bêguneh bi bêdilovanî ve didatin bibombebarandin.

Ligel van hemû bi serdadên sipahî ve destpêkirinên firehî girtinan û dîrkiranan ji bona Zaroyên heremê dihatin bikirin. Herwehajî serdarîya Iraqî herema Barzan ji pêşkeşkirina hemû kar û barên fêrkirinê, tendurustîyê û çandinîyê date bibêpişk û bibêbehrkirin.

Ebdul-Ilah, Nurî Seid û Edmonds Rawîşkarê Ingilîzî bi kîna xweyî kûr ve beramberî Barzanîyan dihatin binavûbangkirin; jiber ku wan Barzanî bi Komonistîyê ve û bi bestandina wan ve ligel Sovyêtê de didatin bitawanbarkirin.

Jîbervêjî ve şûreşa tîrmehê date bikirin, ku ew wan ji sitembarîyê, derbiderkirinê û perçeperçekirinê bide birizgarîkirin û ew ji bona wan avrûwê bide bivegerandin.

Şêx Ehmed Barzanî²⁵ di nava zindana Begdadê de dihate birûniştin, gava ku şureş hate bivêxistin û birayê wî Mustefa Barzanî ligel 500

²⁵Der sala 1947 de Şêx Ehmed bi darvekirinê ve hate bidadkirin; lêbelê serdarîya Iraqî bi cîanîna dadkirinê ve date birawestandî. Şêx Ehmed hîç tu daxwaza lêbuhurandinê ji bona Rasipêr yanjî Nurî Seid neda bikirin; tevî ku Ingilîzan beramberî sozên pir jê re ligel wî jî de dane bihewildan. Ew di zindanê de tanî şûreşa 14 tîrmehê de hate bimayîn.

Hevalên xwe ve bi Penahinde ve li Yekîtiya Sovyêtê de dihatin bidîtin. Herwehaji hin ji malên wan di bin rûniştina zordariyê de li Begdadê de û hinên din li Hewlêrê de dihatin bidîtin.

Barzanî pir bi hêjabûn û dildariya miletê Iraqê û Rêberên wiyî Siyasiyên Welatperwer ve jiber xebata wanî talî dijî serdarîkirina Osmanî û di pişt re jî bi dijî pêla Padîşahî û Impiryaliya Ingilîzî ve hatin bixelatkirin. Jibervêjî ve Rêberîya Şûreşa 14 tîrmehê ji roja wêyî pêşî de bi ser bala xwe ve date bihiladn, ku ew wê sitembariyê û wê bêbextiyê bide bihilanîn, yên ku ew bi wê Eşîra gerans ve hatibûn bikevtin. wê gavên bi karkirî ve ji bona bicîanîna hilanîna wan bi serhatîyan ve date biwergirtin. Wê bi berdana Şêx Ehmed ji zindanê ve date bidestpêkirin û ev gava hanê ji bona Barzanîyan gelekî bi giringî ve dihate biderkevtin. Gava ku Şêx Ehmed ji zindanê hate biderkevtin û wî berê xwe ber bi xaniyê xwe ve li Iwadiyê de date bivedan, ew bi hêjabûn ve ji bal komên Kurdan de lê hate bipêşewazîkirin, ji yên ku ew ji heremên cudan ji Kurdistanê ji bona vê beşdarbûna bi bextiyar ve bi vê hatina hanê ve hatibûn binardin.

Şêx di roja 21. 7. 1958 de ji zindanê hate biderkevtin û ew di roja paş de bi serdana Wizareta Liberxwedanê ve hate biçûn, da ku ew sipasî û piştgirtina xwe ji bona Rêberên şûreşê bide bipêşkeşkirin. Ebdul-Kerîm Qasim bi hêjabûn û rêz ve lê date bipêşewazîkirin û di cara pêşî de bû, ku Şêx Ehmed Barzanî dilsoziya xwe ji bona serdariya şûreşê û Rêberê wêna date bidazanîn. Belam Ebdul-Selam Arif li dîtinê de nehate biamadebûn; lêbelê li ser zimanê wî de hate biveguhêstin, ku heger ew li wêderê de bihata biamadekirin, dê wî ji Şêx Ehmed re bida bigotin: "Kake biro, biro".

Şêx Ehmed Barzanî duwanzdeh salan di zindanên pêla Padîşahî de hate bimayîn û wî serê xwe nedate bitewandin û herwehaji wî tu nivîsandîneke lêbuhurandinê ne ji bona Padîşah û neji ji bona Nurî Seid date bipêşkeşkirin.

Di payîna meha tîrmehê de serdariya şûreşê destûr ji bona Şêx Ehmed, birayên wî û malên wan bi vegerandin ji bona Barzan date bidan û herwehaji wê ji wan re destikên veguhestinê date bilikarxistin. Hiç Merov nikare pesnê pêşewazîya cemawerayî mezin bide bidan, ya ku ew ji bona Şêx Ehmed û Hevalên wîna ji bal Cemawerên Kerkuk û Hewlêrê

de hate bikirin.

Barzanîyan di cara pêşî de ji xwe re dane bihesyarîkirin, ku ew bi Neşînvânên Iraqî ve têtin biderkevtin û ew bi xwedanê mafeyê jîyanê di vî welatê hanê de têtin biderkevtin. Herwehajî ji wan re di wê bêhna mayînî de hate bidubarekirin, ku gorîyên wanî pir di berangarîya beramberî Impiryalîya Ingilîzî û pepûka wanî çêkirî ji serdarîya Padîşahî de ne bi ber ba ve hatin bikevtin û ew niha berên wê ji xwe re didin biçîn.

Bi rastî jî ve divê bête bigotin, ku Rêberîya şûreşa 14 tîrmehê bi dadwerî ve ligel Barzanîyan de date bireftarîkirin û wê ji bona wan alîkarîyên pir date bipêşkeşkirin, da ku bi çakî ve li wan de bête bivegerandin, ji wan zîyanên ku ew bi wan ve di pêla Padîşahîyê genî de hatibûn bikevtin. Herwehajî ji bona pirojeyên cudan ji bona bi pêşvekevtina heremê ve hate bipilankirin.

Herwehajî Barzanî jî ji alîyên xwe de ji bona Serbazên dilsoz hatin biveguhertin, da ku ew li ber şûreşa tîrmehê de bidin bidan û di pir hatinan jî de wan bi xwîna xwe ve li ber wê de dane bidan. Bawerî di navbera Ebdul-Kerîm Qasim û Barzanî de pir bi berz ve tanî dawîya sala 1959 de dihate bixurtkirin. Di piştî vê dema hanê de bawerî di navbera wan de hêdî hêdî ji ber hoyên pir de dihate bilawazîkirin, ji yên ku ez dê li ser wan de di derîyê tê de bidim biaxivtin.

Vegera Barzanî ji Mosko ji bona Begdadê

Barzanî ji me re didate bigotin, ku wê nûçeya rabûna şûreşê li Iraqê de ji peyvîneke telefonî de ji xwe re ji Mîrza Voloşin date biwergirtin, yê ku ew yekek ji Kadirên Sikretêriya Komitîya Nawendîyî Partîya Komonistî bû û ew ji Merovên Xoroşov bû.

Barzanî li Mosko de dihate birûniştin û wî jî ji aliyê xwe de ev xebera rabûna şûreşeyî hanê li Iraqê de bi Hevalên xweyî din ve date bigihandin, ji yên ku ew di nava bajarên din de li Yekîtiya Sovyêtê de dihatin bibelavkirin. Pêwistîya Merov pir bi remankirinê ve nayête biderkevtin, bê kanî çî qasî ji wan re kêvxweşî bi mezin ve dihate biderkevtin, ya ku ew hemû pê dihatin bipoşandin û herwehaji hêvîya vegerandinê ji bona welatê şîrên ji bona wan dihate biderkevtin, piştî dûrbûna jê bi bêtir ji duwanzdeh salan ve dihate biderkevtin.

Barzanî ji Mosko di 21. 8. 1958 de berê xwe ber bi Romanya ve ligel herdu Hevalên xwe Mîrhac Ehmed û Es-ed Xweşevî de date bivedan. Li wêderê de Serokê Romanî pêşewazî lê date bikirin. Herwehaji wî ji Buxarêst di rêya balyozxana Komara Erebiyî Hevgirtî de birûskek ji bona Ebdul-Kerîm Qasim date binardin, ya ku ew têde wî bi serkevtina şûreşê ve dide bipîrozîkirin û ew ji wî rêpêdana vegeerê ji bona Iraqê ji bona xwe û Hevalên xwe dide bidaxwazîkirin.

Ji Buxarêst Barzanî ji bona Pirag hate biçûyîn û ew li wêderê jî de ji bal Serokê Çîkoslovakya Mîrza Entonî Nivotnî de hate bipêşewazîkirin, yê ku wî bi pêwendîyên dostaniya xwe ve ligel Barzanî de tanî rojên xweyî dawî jî de didate biparastin. Ji Piragê ev nameya haneyî tê ji bona Ebdul-Kerîm Qasim hate binardin:

Gewreyê Rêberê meyî şêrin Serdarê Cengoş Ebdul-Kerîm Qasim
Qehremanê Şûreşa Iraqîyî pîroz!

Bi navê birayên minî Kurdên Iraqîyê derkevtî ve di nava serdarîyên Sosyalistî de ez li we silavdikim û şûreşa milletê Iraqîyî xebatvan pîrozdikim, ya ku we û Hevkarên weyî Qehreman ew datin bipêşkeşkirin, ya ku wê Impiryalîya lanetkirî û Padîşahîya genî date

binabûdîkirin û herwehajî wê komên miletê Iraqê bi Ereb û Kurd ve ji nizimbûnê, ji zordariyê û ji bendîtiyê date birizgarîkirin. Wetov bi vî rengê hanê ve we rûpelekî mayînî di mêjûwa xebata gelê Iraqêyî comerd de û bi taybetî ve di mêjûwa tevgerên azadîxwazîyên cîhanî de di vê serdema hanê de bi giştî ve date bitomarîkirin.

Bi dazanîna we ve bi Komara Iraqî ve we armanca daxwestî date bicîanîn, ya ku ji bona wêna miletê Iraqîyî gernas ji şureşa Iraqêyî bi nav û bang ve -1920- didate bixebatkin, tanî ku ew li ser destên we de biserkevtina pîroz hate bidîtin. Azadîxwazên Kurd li Iraqê de kêlek bi kêlekê ve ligel birayên xweyî Azadîxwazên Ereb de didatin bixebatkin, da ku ew vê mebesta bi avrû ve bidin bicîanîn.

Şûreşên Barzanîyan bi xwe jî ve bi perçeyekî ve ji zincîra xebata miletê Iraqê bi dijî Impiryalîyê û Padîşahîya genî ve di welatê şêrîn de dihatin biderkevtin, tanî ku di encamê vê xebata dijwarî dirêj de û li jêr zînetan de, yên ku di nava wan de Impiryalî di nava welatê me de û bi saya Nokerên wan ve bi Zaldar ve dihatin biderkevtin, em bi derkevtina jî welêt ve bi neçarîkirin. Em li ser xebata xwe de bi dijî Impiryalîyê û Nokerên wî ve li derve de û ji nava xakên dewletên Sosyaliştîyî azad de dihatin biçûyîn. Me ji dil û can didate bibawerîkirin, ku dê Impiryalî û Nokerên xwe bêtin bişikenandin û ew dê ji nava welatê me bêtin biderkin, mîna ku ew ji deverên dinîyî Erebîyî birayî rizgarkirî ji Mîsrê, Surî, Yemen û yên din hatine biderkin.

Belê roja 14 tîrmehê bi berbeyaneke nuh ve tete biderkevtin, ya ku tede hêvîyên me hatin bicîhatin û ya ku tede evîndariya me ji bona vegera me ji bona welatê meyî şêrîn hate bigeskin, da ku em kar ji bona miletê xwe bidin bikirin û liberxwedanê li ber Komara xweyî nuhatî bidin bidan. Me dan û sitendin ligel Balyozê Komara Erebîyî Hevgirtîyî bira de li Komara Romanîyî Gelêrî de û herwehajî li Komara Çikoslovakîyî Gelêrî jî de di rojên pêşîyî şureşê de datin bikirin, ji bona ku ew ji bona me Pasportan bidin bidan, da ku em ji bona welatê xwe bêtin bivegerandin; lêbelê tanî niha jî hêj me tu bersiv ji wan ji bona xwe nedaye biwergirtin.

Em vê mebestê ji bon Gewrebûna we didin bipêşkeskin û em bihêvîdarîn, ku dê hûn yarmetîya me ji bona vegerandina me ji bona welatê meyî şêrîn bidin bikirin, da ku em ligel Neşînvânên dilsoz de di

kar de ji bona Komara me bêtin bibeşdarîkirin.

Di dawîya dawî de ez ji Xwedawend hêvîdarim, ku ew dê we ji bona pakkirina welêt ji Nokerên Impiryalîyê bi carekê ve bide biservexistin û herwehaji dê ew we ji bona çakkirina zînetên milletê Iraqîyê gernas û ji bona pêşvexistina welêt di berztirîn pêşkevîtin û bajartîyê de bide biservexistin, ji yê ku pêla Padîşahî ew dabûn bigenîkirin. Herwehaji ez ji bona hêjabûna weyî merd û Hevkarên weyî Qehreman tendurustiyê û xweşbûnê didim bihêvîdarîkirin.

Herbijî Komara Iraqîyê mayî û herbijî Rêberên Qehremanên şureşa Iraqîyê pîroz û herbijî Serdar Cengoş Ebdul-Kerîm Qasîm û Hevkarên wîyî Azadîxwaz. Herbijî Biratîya Erebiyî Kurdî di jêr sîbera yekîtiya Iraqî de.

Ez hêvîdarim, ku hûn bizanibin, ez niha li Komara Çîkoslovaki de li bajarê Lêdîs de ligel Hevkarên xwe Mîrhac Êhmed û Es-esd Xweşevî de têtîm bijîyandin²⁶.

Morkirin
Birayê we û Kolê milletê Iraqê
Mustefa Barzanî
Pirag di 29. 8. 1958 de

Ebdul-Kerîm Qasim li ser birûsk û nameya Barzanî de wetov date bibersivkirin:

Me birûsk û nameya we bi dilxweşî ve datin biwergirtin. Em bi xêrhatina we tevan ve ji bona Iraqa şêrin didin bikirin. Me hemû kar û bar dane bikirin, da ku lêbuhurandin bête biderkevîtin û hatina we, Mîrhac, Es-ed Xweşevî û heryekê din ji Neşînvânên me ligel we de bête bihêsanîkirin. dan û sitendîne ji xwe re ligel balyozxana Komara Erebiyî Hevgirtî de li Pirag - Çîkoslovakya de bidin bikirin, da ku ew vegeadina we ji we re bide bigirawkirin²⁷.

²⁶Xelîl Ibrahîm Hisên, Şûreşa Şewaf, r. 184, çapa yekem.

²⁷Kanîya pêşî, r. 186.

Serdar Cengoş
Ebdul-Kerîm Qasim
Serokê Wizaretê
di 2. 9. 1958 de

Di wê rojê bi xwe jî ve Wizaretê Derve ji bona Balyozxana Komara Erebîyî Hevgirtî de li Piragê de date bibirûskirin, da ku ew vegerandina Barzanî û Hevalên wîna bide bihêsanîkirin.

Min di nava kaxezên Barzanî de daneyek ji birûska dawî date bidîtin, ya ku wî ew ji bona Ebdul-Kerîm Qasim de dabû birêkirin û wî têde sipasîya xwe li ser rêpêdana ji bona wî û Hevalên wî de bi vegeê ve ji bona welêt dabû biderxistin. Ev jî metnê wê ye:

Serwerê Rêberê Miletê Mezin Serdar Ebdul-Kerîm Qasim!

Bi navê xwe û hemû birayên xweyî Kurdên Xebatvan ve em careke din wê pîrozdikeyn û herwehaji em Miletê Iraqî bi Ereb û Kurd ve bi şureşa wîyî pîroz de didin bipîrozkirin, ya ku wê Impiryalî, Kevneperestî û Zordariya Padîşahiyyî genî date binabûdîkirin. Vê şureşa hanê rê li ber Milet de date bivekirin, da ku ew li ser rêya azadiyê, demokrasî û aşîtyê de bête bipêşkevtin.

Ez û Hevkarên xwe bi navê Miletê Kurd ve soz ji we re didin bidan, ku dê emê xebatê ji bona piştgiirtina hebûna Komarê û parastina wêna bi piştgiirtinê ve ligel birayên xweyî Ereb de dijî hemû pêrabûnên Impiryaliyyê û Nokerên wê bidin bikirin.

Ez xwe û Hevkarên xwe nala Serbazan di pêşrewa Xebatvanan de ji bona liberxwedana Komara meyeî nuhhatî de, Komara Ereb û Kurd li jêr Rêberîya we de didim bidanîn.

Serwerê Serokê Milet: Ez vê kêsê ji xwe re didim biwergirtin, ji bona ku ez ji bona we paktirîn sipasîya xwe û sipasîya Hevkarên xweyî barkirî ji bona nava welatên Sosyaliştî bi rêpêdana vegeê ve ji bona welatê meyi şêrîn bidim bipêşkeşkirin, da ku em bi rûmet ve di berxwedana li ber pirsê Miletê xweyî Mezin de pirsê liberxwedana li ber

74 Barzanî û Tevgera Azadîxwazîya Kurd 1958 - 1961

Komarê û pêşkevtina wêna de bêtin bibeşdarîkirin.

Bijî Serdar û Rizgar Ebdul-Kerîm Qasim.

Her û her bijî biratîya Ereb û Kurd.

Mustefa Barzanî

10. 9. 1958 de

Partî Şandek ji bona çûna Piragê date bidurustkirin, da ku ew hevrîyê ligel Barzanî de ji bona vegeza bi serkevtî ve ji bona welêt bide bikin. Şand ji van Mîrzan dihate bipêkhatin: Ibrahîm Ehmed, Nurî Ehmed Taha, Sadiq Barzanî, Ebeydul-Lah Barzanî û her wehajî Mîrza Salih Mîran li Qahire de bi Şandê ve hate bitevlêkirin.

Herwehajî birûskên piştgirtinê ji Partîyan û Kesatîyên Welatperwerên Ereb û Kurd bi ser Ebdul-Kerîm Qasim ve hatin bibarandin, yên ku ew wî didin bisipasîkirin û li wî de di birayara wî de ji bona rêpêdana vegeandina Barzanî û Hevalên wî ji bona Iraqê didin bipiştgirtin.

Di pişt re hate bidiyarîkirin, ku Ebdul-Selam Arif birûsk û nameya Barzanî ji ber Ebdul-Kerîm Qasim û Civata Wizaretê dabû biveşartin, jibervêjî ve mayîna Barzanî li Romanya û Çikoslovakya de hate biderengîkevtin; jiber ku wan nêzîka mehekê çavdêriya bersiva serdarîya şureşe didatin bikin.

Barzanî di dawîya kewçîrînkê sala 1958 de hate biderkevtin û wî berê xwe ber bi Qahire ve date bivekirin. Cemal Ebdul-Nasir pêşewazîyeke pir bi germî ve di mala xwe de lê date bikin. Wetov Barzanî kelpîçê pêwendîya mêjûyî ligel Rêberê tevgera mîlîyî Erebî date bidanîn.

Di dawîya dawî de û piştî dûrbûneke bêtir ji duwanzdeh salan de Barzanî di roja 6. 10. 1958 de ji bona Begdadê hate bigihandin. Ew bi rengekî mîrî û gelêrî ve hate bipêşewazîkirin, ku ji kevtina nava seryan bi derbû. Bi dehan hezar ji Zaroyên mîletê Iraqî ji Ereb, Kurd û Kêmayan de ji bona Balafîrxana Mesna hatin biamadebûn û wan Barazanî nala Pehlewanan datin bipêşewazîkirin. Wan didatin bibangkirin:

Barzanî bi xêr û bêrî hafî bo milletê Iraq bi kêfhatî

Hemû partîyan di wê pêşwazîya mezin de datin bibeşdarîkirin, belam divê li vêderê de bête binîşandan, ku partîya Komonist ji tevan bêtir gewretirîn jimar ji Endam û Layîngîrên xwe ve date bidagirtin.

Barzanî li Mêvanxana Semîramîs de bi Mêvandarê serdarîya şureşê ve hate bidakevtin. Ew di demjimara dehê berbeyanîya roja 7. 10. 1958 de bi serdana Serdar Ebdul-Kerîm Qasim ve hate birabûn û wî jêre sipasî û hêjabûnên xweyî mezin dane bipêşkeşkirin û herwehaji wî jêre di vê dîtinê de date bigotin: "Ew xwe bi Serbazekî ji Serbazên şûreşa tîrmehê ve û li jêr fermanarîya Serdar dide bidanîn".

Vegerandina Barzanî ne bi rûdaneke sad ve dihate biderkevtin. Ew hate bivegerandin û pêrejî wî xebata netewê Kurd didate bigedekirin û wî hêza Kurd bi ser hêza Ereb ve ji bona liber xwedana Komarê didate bibêtirikirin. Herwehaji di vegerandina wêna de bawerî di navbera milletê Kurd û serdarîya nuh de hate bixurttirikirin û biratîya Ereb û Kurd hate bihîmtirikirin. Barzanî ji bona Iraqê nala durujmê xebata netewê Kurd hate bivegerandin û wî ligel xwe de evîndarî û dilsozîya Kurd li hemû perçên Kurdistanê de ji bona şureşa 14 tîrmehê û Rêberê wêna didate bihilgirtin.

Amadebûna Şandên gelêrî ji heremên cudan li Iraqê de ji Kurdistan, ji Naverast û ji Jêr de ji bona Begdadê li dûhevdû de dihatin bigihandin, da ku ew bi xêrhatinê ve li Barzanî de bidin bikirin û wî bi vegerandina wîyî biserkevtî ve ji bona welatê şêrîn bidin bipîrozîkirin. Barzanî gotineke kurt ji bona Şandîyan date bi gotin, ji yên ku ew di baxê mêvanxana Semîramîs de hatibûn bikomkirin û evaya jî metnê wê ye:

Lawên Welatê minî şêrîn!

Hûn dizanin, ku ez û Hevalên xwe bi derkevtina ji welêt ve di encamê xebata meyî çekdarî de di nava rêzên millet de bi dijî zordarîya serdarîkirinêyî genî ve di pêla rizyayî de û axayên wanî Impiryalî de hatin bineçarîkirin.

şêrîntirîn awatên me di tevaya jîna wan salên dirêj de -Yanzdeh Salan-, yên ku me ew di xebatê de bi dijî Impiryalîyê û Nokerên wî ve

datin bibuhurandin, di bicîanîna hêvîyên milletê Iraqê de di serxwebûnê, azadîyê û aşîtîyê de dihatin biderkevtin.

Me xwest, ku em ji bona Iraqê bêtin bivegerandin, di gava ku me nûçeyên şureşa Iraqîyî pîroz di rûja wêyî pêşî de date bibihistin, da ku em jî di avrûwa liberxwedana Komarê de ji zayîna wêna de bêtin bibeşdarîkirin. Ez ji bona Peyên şûreşê didim bisipasîkirin; jiber ku wan rê ji bona vê kêsa hanê ji me re dane bivekirin. Ez ji we re li ber millet de didim bisozûbeymankirin, ku dê ez û Hevkarên xwe di pêşrewîya Xebatvanan de bêtin biderkevtin, ji yên ku ew dê li ber vê Komara nuhhatî de li pênavê pêşkevtin û geşbûna wêna de bidin bidan. Herwehaji dê emê di yek rêzê de bi Ereb û Kurd ve li jêr rêberîya Kurê milletî pak de Serwerê Serdar Abdul-Kerîm Qasim de bêtin birawestandin. Bijî Komara Iraqî! Bijî biratîya Ereb û Kurd²⁸!

Rojnamevanê Sovyêtîyî bi nav û bang ve Dêmcenke di dema vegerandina Barzanî de li Begdadê de dihate bidîtin û wî pêşewazîya mezinî jê re girtî li wêderê de bi vî rengê hanê ve date bipesindan: "... di berbeyanîya wê rûjê de dengên berzî bilindî li ser şeqaman de ez datim bişiyarkirin. Rêz bi rêz ve ji Otombêlên bi kirê girtî ve û bi alên Iraqî û cawên sipî ve hatibûn bixemilandin, ji yên ku li ser wan cawan de durujim bi Erebî û Kurdî ve hatibûn binivîsandin. Wan Otombêlan bi zor ve dikarîbûn rêya xwe di nava wan komên komkirî de ji cemawaran bidin bivekirin, ji yên ku wan Wênerên hatî ji Kurdistana Iraqê de di nava xwe de didatin bibarkirin, da ku ew li Qehremanê xweyî milî de bidin bipêşewazîkirin. Ew bi şevê ve hatibûn birêkevtin, da ku ew di dema dakevtina Balafîriyî biryarkirî de bi balafîrxanê ve bêtin bigihandin. Wan didatin bibangkirin: Her bijî dostanîya Ereb û Kurd û bi hezaran ji Xelkên rêzkirî ve li ser tengalên rêyan û piran de ew durujmên hanê didatin bivegerandin. Herwehaji depên sade hatibûn biberzîkirin, ku li ser wan de wêneyên Serbaz û Cotkarên ji Ereb û Kurd hatibûn binigarîkirin, yên ku destên wan di nava hevdû de dihatin bikevtin û wan bi germî ve silav li hevdû de didatin bikirin. Ev bidurujmê yekîtiya milîetê Iraqê de dihate biderkevtin. Mîna van cawên sipîyî nivîsandî li ser

²⁸Ji Arşîva partîya Demokratî Kurdistanî

pir avanîyan de ji bona nîşa pêşewazîya hatina Barzanî pîroz de dihatin
bibierzkirin...²⁹.

²⁹Pavil Pavanoviş Dêmenke: Kurdistana Iraqêyî Gûrbûyî, r. 8, bi zimanê Erebî ve,
Wergerandina Dr. Cercîs Hesên, çapa Xebat.

Dengê Kêra vegerandina Barzanî ji bona Welêt di hundurû û derve de

Ew pêşewazîkirina mezin ji bona Barzanî di Balafîrxana Begdadê de û beşdarbûna bi hezaran ve têde ji Lawên milletê Iraqî de ji Erebb, ji Kurd û ji Zaroyên Kêmayan de bi baştirîn bersiv ve li ser tevaya wan zimandirêjan de ji Şovîniyan û Kevneperestan de tête biderkevtin, ji yênan ku wan didatin bixwestin û hêjî tanî vê roja hanê jî didin bixwestin, ku ew ji giringbûna wê pêşewazîya hanêyî mezin bidin bikêmkirin û ew wê bes û bi tenha ve ji bona jêhatîbûnên herdu partîyan, partîya Demokratî Kurdistan û Partîya Komonistî Iraqî didin bivegerandin. Bêyî ku ew pê bêtin biliberkevtin, ku ew bi van goyên xwe ve baştirîn belge ji bona mezinbûna qewara kêra herdu Partîyan didin bipêşkeşkin.

Miletê Iraqî di wê roja pîroz de gotina xwe date bigotin û hîç kes nikarin bi armancên xwe ve bêtin bigihaştin, ji yênan ku ew dixwazin di mêjûwê de bidin bisextekarîkirin. Rastî nayête binemankirin; belkî ew li jêr giranbûna sawê û bêbextîyê de bête biveşartin; belam ew dawîya dawî de wêneyê xweyî sipî dide bivegerandin.

Rehberên Partîyên Welatperwer bi xêrhatina Barzanî ve dane bikirin û pêwndîyên dostanîyê û hevkarîyê di nava wan de hatin bidurustkirin û ez ji wan jî bi taybetî ve Mîrza kamil Çadirçî didim bibîrxistin.

Belam ji wanên ku ew ji hatina Barzanî dihatin bitirsandin, ew bi jimareke kêma ve ji Kîndaran, Derebegan dihatin biderkevtin û herwehaji ew ji wan Kurdan jî dihatin biderkevtin, ji yênan ku wan her û her ji bona Nurî Seid û Ingilîzan di dirêjbûna jîna xwe de didatin binokerîkirin û wan ji xwe re bêbextî bi kar ve dabûn bikirin. Hîç ev bi lihevraştati ve nedihate biderkevtin, ku wan Merovên hanê ligel Şovîniyên Erebb de didane bilihevkin û helwesta wan ligel helwesta Ingilîstanê, Turkî û Iranê de dihate bisuwarkirin.

Jimarekê ji Dadyarên Iraqî birûskek ji bona Ebdul-Kerîm Qasim datin binardin, ya ku ew têde piştgirtina biryara wergirtî li ser vegerandina Barzanî û Hevalên wî de ji bona Iraqê didin bikirin. Evaya

jî metnê wê ye:

Serwerîya Serdarê Cengoş Ebdul-Kerîm Qasimê hêja!

Bi biryara weyî mezin ve ji bona bi xêrhatina vegerandina Xebatvanê mezin Mele Mustefa Barzanî, yê ku wî serê xwe di rûwê Rê-sitika Impiryalîyî Padîşahîyî genî de date birakirin, dengedaneke wêyê mezin û şahîyeke wêyî kûr di nava cerg û hinavên tevaya Lawên millet de ji Ereb û Kurd de hate biderkevtin.

Vegeandina Şureşvanê mezin Mele Mustefa Barzanî, Birayên wî di xebatê de û hemûyên ligel wî de, ji yên ku ew ji ber xebatên xweyî welatî hatibûn biderkirin, tanî radeyekî mezin canê xebata hevbeşî di navbera herdu milletan de ji Ereb û Kurd dide bixurtkirin û ew piştgirtina Komara nuhatî di pêşkevtinê de û di parastina wêna de ji her destekî gemarî de dide bigirtin, herwehaj ew asûwên nuh di azadîyê de, di serxwebûnê de û di jîyaneke bi avrû de dide bivekirin.

Bi navê dadyaran ve em avêtina gava weyî mezin ji bona bi xêrhatina vî Neşînvânê mezin ve ji bona welatê wî didin bipîrozkirin.

Her bijî Komara nuhatî, her bijî Serwerîya Qehreman Ebdul-Kerîm Qasîm.

Her bijî biratîya Ereb û Kurd³⁰.

Li ser vê birûska hanê de 52 dadyaran dabûn bimorkirin. Di nava wan de ev Mîrzayên hanê jî dihatin biderkevtin: Tewfîq Munîr, Kamil Qezançî, Emir Ebdul-Lah, Ebdul-Rehîm Şerî, Ebdul-Setar Nacî, Bedîî Omer Nezmî, Dawid Xemas, Dawid El-Sayix, Qusey El-Qadî, Wirya Elî Kanî Maranî û Nurî Talebanî.

Herwehajî jimareke pir ji birûskan û nameyan ji bona ser Barzanî hatin bibarandin, ku di wan de pîrozkirina wî ji bona vegeandina welêt dihate biderkevtin. Em hin nimûna ji wan di belgeyên -1, 2, 3, 4 û 5- de di pêvekirina Belgan de didin bibelavkirin³¹.

³⁰Xelîl Ibrahîm Hisên, Şûreşa Şewaf, r. 187, çapa yekem.

³¹Ji Arşîva partîya Demokratî Kurdistanî

Kêrkin li derve de

Derbasbûna Barzanî di rêya vegera xwe de ji bona welatê xwe di ser Qahire re û dîtina wîna ligel Serok Cemal Ebdul-Nasir de bi xêrhatina Komara Erebiyî Hevgirtî ve ji bona Barzanî û vegera wî dide bibarekirin. Herwehaji Yekîtiya Sovyêti û dewletên Sosyalişti bi vegera wî ve hatin bidilxeşkirin; jiber ku ew bi Dostekî wan ve dihate biderkevtin û ew di nava diyarên wan de yanzdeh salan hatibû birûniştin û ew ji bona nava welatê xwe piştî bi serkevtina şureşeke welatîyî demokrasî ve tete bivegerandin.

